Bi gotinên zanan bikin lê, bi finasên (kiryarên) wan nekin.

Ji gotinên mezinan

Berhevkirin: Kurdistan Abdullah

1- Ez bêdengiyê ji pirrbêjan fêr bûme, bêhnferehiyê ji bêhntengan û xêrê ji nexêrxwazan. Lê, seyre ku ez xwe qerdarê van mamostan nabînim.

Cibarn Xelîl Cibran

2- Ji Îskenderê mezin pirsîn:
- Ji bo çî tu rêzê ji mamostayê xwe re bêhtir ji bavê xwe digirî?
- Bav jiyanek nemanî diyarî min kri lê, mamostayî jiyanek nemiriyane.

Ji pirtûka Gulên Adebê

3- Dijwariya mamostayî ji dilovaniya bavî çêtire.

Meteloka farisî

4- Pêdivî ye ku tu ji dijimin jî fêr bibî.

Ovîdî

5- Yê mezin perwerde bike, yê biçuk bi xwe dê fêr bibe.

Metoloka erebî

6- Tiştê xirab, mirov bê mamoste fêrî dibe.

Metloka entîk

7- Bela ew nebe şagird, yê ku ji mamosaytê xwe zanetir nebe.

Liyonardo davînşî

8- Ew kesên ku me hîn dikin, mafên xwe hene ku bibin mamostayên me belê ne heryek xwediyê vî mafî ye.

Gotê

9- Mirovê ku hez ji mirovî bike, dikare fêr jî bike.

Gotê

10- Şagirdeyê baş, ew e yê ku şaşiyên mamostayê xwe dibîne û bêdeng dimîne lê, ji xwe re dike wane.

Meteloka rûsî